K.T.
Zanîngeha Mardin Artukluyê
Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê
Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

DI SÊ ROMANÊN KAFKASÊ DE DU NIMÛNEYÊN FOLKLORÎK: GOTINÊN PÊŞIYAN Û BIWÊJ

Xwendekar:

Suzan BOZYEL

15721066

Şewirmend:

Alk. Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK

Mardin 2018

KURTE

Mijara vê xebatê; di sê romanên kurdî/ kurmancî de du nimûneyên folklorîk; gotinên pêşiyan û biwêjên ku di romanan de derbas dibe dîtin, gorî elfabeya Celadet Bedirxan rêz kirin û bi kurtasî şîrove kirin e. Me sê pirtukan bo vê xebatê hilbijart. Ev sê pirtûk ji herêma kafkasê hat hilbijartin. Çimkî em êdî zanin ku berhemên herêma kafkasê zêdetir bin tesîra çanda kurdî de maye. Pirtûkên ku wek nimûne me hilbijart ya yekem romana Wezîrê Eşo; Sîber, ya duyem pirtûka Sehîdê Îbo; Kurdê Rêwî, pirtûka sêyem jî ya Erebê Şemo;Kurdêd Elegezê ye. Di her sê romanan de jî em şahidê jiyana kurdên kafkasê, pergala wan a siyasî û civakî, kevneşopiya wan dibin. Ji aliyê teknîkî ve jî nimûneyên folkolra kurdî bala mirov dikêşe. Em di vê xebatê de jî cih didin can nimûneyên folklorîk ku di berhemên wêjeya modern, romanan, de çawa cih girtine.

Beşa yekem de em ê behsa jiyana Wezîrê Eşo, Sehîdê Îbo, Erebê Şemo bikin. Bi kurtasî derheqê pirtûkê wan; Sîber, Kurdê Rêwî û Kurdêd Elegezê de agahî bidin û pênaseyên gotinên pêşiyan û biwêjê bikin.Beşa duyem de nimûneyên gotinên pêşiyan û biwêjên ku me ji sê pirtûkên berhev kiriye rêz û şîrove bikin. Bi encamê xebata xwe xilas bikin.

Bêjeyên Sereke: Sîber, Kurdê Rêwî, Kurdêd Elegezê, Gotinên Pêşiyan, Biwêj.

NAVEROK

KURTE **2**

NAVEROK **3**

DESTPÊK **5**

1.Armanc û Çarçoveya Teza Lîsansê 5

2.Rê û Rêbaz 5

BEŞA YEKEM

1.1. Jiyana Wezîrê Eşo 6

1.2. Sîber 6

1.3. Jiyana Sehîdê Îbo (Sehîdê Rizgo Îboyan) 7

1.4. Kurdê Rêwî 8

1.5. Jiyana Erebê Şemo 8

1.6. Kurdêd Elegezê 9

1.7. Gotinên Pêşiyan 9

1.8. Biwêj 10

BEŞA DUYEM

2.1. DI PIRTÛKA SÎBERÊ DE NIMÛNEYÊN GOTINÊN PÊŞIYAN **11**

B, D, H, J, M 12

2.2. DI PIRTÛKA SÎBERÊ DE NIMÛNEYÊN BIWÊJAN 12

A, B 12

Ç, D 14

E 16

G, H, J 17

K 18

L, M, P 19

R 20

S 21

T 22

2.3. DI PIRTÛKA KURDÊ RÊWÎ DE NIMÛNEYÊN GOTINÊN PÊŞIYAN 22

B......22

C,D......23

E,G,H,J......24

K,L,M......25

S,T,W,X......26

Z......27

2.4. DI PIRTÛKA KURDÊ RÊWÎ DE NIMÛNEYÊN BIWÊJAN......27

A, B......27

C, Ç......29

D......30

E......32

F, G, H......33

J......34

K,L......35

M, N......36

O, P, R......37

Q, S......38

Ş,T......39

Y,X......40

Z......39

2.5. DI PIRTÛKA KURDÊD ELEGEZÊ DE NIMÛNEYÊN BÊWIJAN......41

A,B......41

Ç,D,E,G......42

H,J,K, L, M, N......43

O,P,R, S, T, X, Y......44

ENCAM......45

ÇAVKANÎ......46

DESTPÊK

1.Armanc û Çarçoveya Projeya Lîsansa Bilind

Armanca vê xebata me ev bûn; dema dibêjin roman edebiyata nûjen tê bîra mirov. Gelo nimûneyên edebiyata gelêrî çawa di van berhemên edebiyên nûjen de cih girtine? Ev pirs di hişê me de pêwistiya vê xebatê ava kir. Me xwest ku edebiyata nûjen û gelêrî çawa têkelî hevdu bûne bi vê xebatê li ser analîza sê pirtûkên kurdî wek nimûne derxine holê.

Bo ku edebiyata kafkasê zêdetir bin te'sîra edebiyata gelêrî de maye me jî ji ber vê sedemê romanên xwe jî ji romanên kurdên kafkasê hilbijart. Sê nivîskarên me yên kafkasê ku bi nav û dengin; Wezîrê Eşo, Sehîdê Îbo, Erebê Şemo bi van sê romanên xwe derheqê jiyana kurdên kafkasê dema sovyetê agahî didin. Em dibînin ku jiyana kurdê wê demê çiqas zêde bin bandora çanda kurdî de maye. Ev sê roman jî ji bo ku ji vê aliyê ve gelek dewlemend in bûn mijara xebata me.

Mijara xebata me ser tehlîla sê romanan in. Em di van sê romanan de du nimûneyên folklorîk digerin. Ev du nimûne; gotinên pêşiyan û biwêj in. Gotinên pêşiyan û biwêjên ku di romanan de derbas bûne em ê bisinifînin; gorî elfabeya kurdî rêz bikimn û ji aliyê wateyê ve şîrove bikin.

2. Rê û Rêbaz

Di vê xebata xwe de ji bo ku em ji aliyê nimûneyên gelêrî ve pirtûkan analîz dikin beşa yekem de nivîskarên ku me li ser pirtûkên wan analîz kir derheqê wan de agahî bidin. Yanî derheqê jiyanê van sê nivîskaran de agahî bidin bi kurtasî behsa sê romanên ku me li ser xebitiye; Sîber, Kurdên Rêwî û Kurdêd Elegezê bikin. Pênaseyên gotinên pêşiyan û biwêjan bikin.

Beşa duyem de em ê pêşî di pirtûka "Sîber" ê de gotinên pêşiyan û biwêjên ku me berhev kiriye, piştê wî jî " Kurdên Rêwî" de gotinên pêşiyan û biwêjên ku me herhev kiriye û di dawî de jî di pirtûka Kurdêd Elegezê de ji bo ku nimûneyên gotinên pêşiyan tune biwêjên ku me berhev kir binivîsin û şîrove bikin.

BEŞA YEKEM

1. Jiyana Wezîrê Eşo

"Nivîskar, wêjezan, dîrokzan, rojnamevan û wergêrê Kurd ê bi nav û deng Wezîrê Eşoyê Hûtî Begê 1'ê mijdara sala 1934'an li paytexta Gurcistanê-Tibilîsê hatiye cîhanê. Xwendin û perwerdeya xwe a destpêkê di dibistanên gundê xwe û ên Tibilîsê de bi giranî bi zimanê Ermenî bi cî anîye. Sala 1958'an fakûltêta Zanîngeha Yêrêvanê a dîrokê xilas kiriye. Salên 1961-1963'an li Lenîngiradê di beşa Kurdzanîyê de a Înstîtûta Rojhilatzanîyê, bûye pisporê dîroka Kurdistanê. Salên 1964-1994'an wekì redaktor, sererastkir û kontrolkirekî çapemenîya Ermenîstanê ê sereke her wisa jî wekî redaktor û wergêrê beşa weşanên bi Kurdî a Radyoya Ermenîstanê li wî welatî; Yêrêvanê kar û barên xwe bi cî anîne (Eşo,2016:4)". Wezîrê Eşo di sala 2015'an de li Brûkselê jiyana xwe ji dest da.

Berhemên wî yên sereke:

Mizgînî	Êzdî (werger)
Xebera Dosta	Pamp-Sîpan
Dengbêj Kal Bûbû	Dosya Barzanî Di Sandoqa Stalîn a Polayî De
Xaçatûr Abovyan	Parîyê Berdemayî
Kurd	Kurdzanê Mezin Qanatê Kurdo
Zargotinzanê Kurd ê Mezin	Îtibarî
Sîber	Qirme
Hosta Hovhannes	Tosinê Ûşan

1.2. Sîber

Sîber ji aliyê Wezîrê Eşo ve hatiye nivîsin. Vê pirtûka ku me li ser xebata xwe kir bi zimanê kudrî-kurmancî hatiye nivîsin. Ji aliyê weşanxaneya Lîsê ve di sala 2016'an de hatiye çap kirin. Çapa yekem e û ji 147 rûpelan pêk tê.

Roman navê xwe ji serlehenga romanê, ji 'Sîber'ê digire. Sîber keçek rind û delal e. Di nav hebûn û rehetiyê de mezin bûye. Ji bo malbata xwe keçekê pir biqîmet e û wek serdestan hatiye mezin kirin. Dema Sîber mezin dibe bi rindî û zanatiya xwe li gundên der dorê bi nav û deng dibe. Lê ji bo ku pir rind û bihuner e cesareta gencên gund tune ku biçine ber deriyê mala Sîberê wê ji xwe re bixwazin. Rojek ji gundekî dûr Temirê kurê Xudo lê dixwaze, mezinên gund dikevin ortê û Sîberê bi Temir re dizewicînin. Pirsgirekên jiyana

Sîberê piştê zewaca wê dest pê dike. Çimkî xwezûrê Sîberê Xudo zilm û zordestiyê bi Sîberê dike ji ber qelendên ku bo xwestina wê dane li wî zêde tê tu dem ji Sîberê hez nake. Bi armanca lê ji layê xwe berdanê zilm û zordestiyê didomîne. Di dawiya romanê de Sîber ji ber zilma xwezûrê xwe li xwe dikuje.

Bi kurtasî; ev roman jiyana û kevneşopiya civaka kurdên herêma kafkasê bi rêya jiyana Sîberê ji me re bu zimanek serkeftî qal dike.

1.3. Jiyana Sehîdê Îbo (Sehîdê Rizgo Îboyan*)*

"Di 8ê Gulana sala 1924an li Ermenîstanê, gundê Qarûxana jorîn ji dayîk bûye. Kolej û Înstîtuya bijîşkîyê ya Yerêvanê xilas kir. Doktora xwe jî li Moskovayê temam kir.Sehîdê Îbo wek bijîşkê zarokan kar dikir.Di sala 1971ê de bû serokê kafêdra bijîşkîya zarokan(pedîatriya) Înstîtuya Yêrêvanê ya Bijîşkîyê.Di sala 1974an de li Washingtonê dibe endamê rêxistina Ortemiletîyê ya bijîşkan nexweşiyên gurçikên zarokan.Li Glazgoyê tê hilbijartin wek endamê rêxistina bijîşkên zarokan li Ewropayê.17 Kanûna yekê sala 1991ê li bajarê Yêrêvanê ji aliyê kesê "nenas "ve hate kuştinê.Hejmara kitêb û berhemên Prof.Dr.Sehîdê Îbo yên îlmî derheqa bijîşkiya zarokan de nêzîkê 100î ne. (Îbo, 2009: 4)."

Hin Berhemên Wî:

Terşînek bûyîna pişikê zarokên 'emrê hetanî yek salî da(monografya, bi zimanzê ermenî,1976)

Danasîn bi bijîşkîya zarokan(monografya, bi zimanê ermenî,1983)

Xwerekdayîna zarokên saxlem (kitêba bijîşkîyê, bi zimanê ermenî)

Şîretê doxtir(kitêba bijîşkîyê, bi kurdî,1974)

Bîst salên din(şî'r bi kurdî)

Quma min(şî'r bi kurdî)

Sînem(şî'r bi kurdî)

Duryan(berhevokên serhediyan, bi kurdî)Kurdên rêwî(roman,1979)

1.4. Kurdê Rêwî

"Romana Sehîdê Îbo "Kurdê Rêwî" bin hestên gilî –gotin û bîranînên dayîka wî Hica 'Evdo hatiye nivîsandin. Sehîdê Îbo hê salên 1959an dest bi nivîsara kitêbên 'ewlin ya vê romanê kir û sala 1979an li bajarê Yêrêvanê di neşîreta "Sovêtakan Grog"(Nivîskarê Sovyetê) bi zimanê kurdî bi herfên kirilî hate weşandin (Îbo, 2009: 9)".

Em di vê romanê de bandora şerên cîhanê yê yekemîn û şoreşa oktobirê ku li ser jiyana kurdên êzîdî çêbûye dibînin. Rêçên adet û usulên kurdan, jiyana wan, rewşa wan ên civakî dibînin.

Pirtûka ku ez li ser lêkolîn dikim bi eslê xwe kurdî û bi tîpên kirîlî hatiye nivîsandin. Çapa pirtûka k udi destêmin de ye aîdê sala 2009an e û ji aliyê Xanna Omerxalî hatiye latînîzakirin.

1.5. Jiyana Erebê Şemo

Erebê Şemo di îlona 1897'an de li bajarê Qersê ji dayîk bû. Erebê Şemo ji Kurdên me yên Êzîdî ye. Jiyana wî di şertên dijwar de dest pê dike. Dema ku zarok bûye şivantî û paletî kiriye. Di sala 1918'an de dema îxtîlala bolşevîk çê dibe û fikrê komunîstiyê bela dibe Erebê Şemo jî di bin bandora vê fikrî de dimîne. Di sala 1918'an de dibe endamê Partiya Komunîsta Rûsya yê. Di artêşa sor de cih digire. Moskovayê de dest bi zanîngeha Lazaryanê dike û heya sala 1924'an li wê dixwîne. " Li zanîngeha Lenîngiradê dersên wêje û zimanê kurdî dide. Di 1937'an de li Lenîngiradê ji alî hêzên Stalînîst ve tê girtin û heta 1956'an sirgûnî Sibîryayê dibe. Romannivîsiya kurdî bi wî dest pê dike (Şemo, 2015:4)". Yekem romana kurdî Şivanê Kurmanca aîdê Erebê Şemo ye. Nivîskar di rojnameya Rya Teze de xebatên xwe domandiye. Nivîskar di sala 1978'an de li Ermenîstanê-Erîvanê jiyana xwe ji dest dide (Şemo, 2015: 1)".

Berhemên Wî

"Koçeke Derewîn (1930) Emirê Lenîn (1930)

Terîqa Rêvolûsya Oktybirê (1930) Kolxoz û Kara Wê Gundya Ra (1930)

Şivanê Kurmanca (1935) Kurdên Elegezê (1936)

Jiyana Bextewar (1959) Hopo (Navbera 1959 û 1965'an)

Dimdim (1965) (Şemo, 2015:1)"

1.6. Kurdêd Elegezê

Pirtûka Kurdêd Elegezê ji aliyê Erebê Şemo ve di sala 1936'an de hatiye nivîsin. Piştê romana heman nivîskar Şivanê Kurmanca duyemîn romana kurdî Kurdêd Elegezê tê qebûlkirin. Pirtûka ku me li ser lêkolîn kir di sala 2015'an de ji aliyê weşanxaneya Belkî ve hatiye çap kirin. Di halê resen de ev pirtûk bi elfabey krîlî hatiye nivîsin û yekem car ji aliyê Rêdûr Dîjle ve hatiye latînîze kirin. Pirtûk wek du beşan hatiye amade kirin. Pêşî bi şiklê latînîze kirî paşî ji bî şiklê resen, krîlî hatiye amade kirin û çap kirin. Romanekî kurt e. Pirtûk gelemperî ji 70 rûpelan pêk tê lê ji bo ku nîvê pirtûkê bi tîpên latînî nîvê din jî bi tîpên krîlî ye em dikarin bêjin ku ev roman ji 29 rûpelan pêk tê.

Romana Kurdêd Elegezê bi teswîrkirina Elegezê dest pê dike. Di vè romanê de Erebê Şemo cih daye jiyana kurdan, kevneşopiya wan, rewşa wan ê siyasî û aborî. Nivîskar bi vê pirtûkê ji me re nîşan dide ku kurdên wê demê di bin bandora fikrên sosyalîst de mane û li hemberê axa û began di nav têkoşînê de bûne.

Di vê romanê de dîsa nivîskar wek romana xwe ya ewil ji jiyana xwe sûd girtiye. Em dikarin bêjin ku wek romanek otobîyografîk e. Ji bo ku duyemîn romana kurdî ye di edebiyata kurdî de cihek girîng digire.

1.7. Gotinên Pêşiyan

Gotinên pêşiyan din ava gel de wek gotinên bav û kalan tê pênasekirin. Hin pênaseyên rewşenbîrên me wisa ye;

"Gotinê pêşiyan tenê beşek ji zargotina gel e,hindek ji wan şîret in, hindek mînak in,hindek jî serhatiyên sosret û balkêşin ku ceribandina hezar salan din ava xwe de dihewînin (Oncu,2009:7)".

"Gotinên pêşiyan ezmûn û tecrubeyên mirovan ên hezar bi salan nîşan didin (Oncu,2009: 5)".

"Gotinên pêşiyan; texlîdeke ji wêjeya gelêrî ye ku, serborî, tecrube û rabirduya civakan bi awakî zargotinî û bi bandor rave dike (Mustafa Öztürk)".

Kadrî Yildirim; "Gotinên pêşiyan, gotinên qalibgirtîyên k udi demên berê de ji aliyê pêşiyan ve hatine gotin û ceribandinên wan ên cûr bi cûr nîşan didin û nifş bi nifş heta roja met ê neqilkirin wekî 'gotinên pêşiyan' tên binavkirin".

“1–Te’rîfa ‘Gotinên Pêşiyan’, gotinên kurt û wecîz in ku ji aliyê wate/ma’ne û naverokê de gelemperiyê dikin (ango îddiayeke tînin zimên), ji navagel derketine ji berk u dem di ser de derbas bûye jêderka wan hatiye ji bîr kirin û bûne malê gel, kêm zêde ji aliyê herkesê ve têne zanîn û di zimanê rojane de têne bi kar anîn. (Birîtannîca a Temel, Cilt:2) (Bingöl, 2014: 5)”.

1.8. Biwêj

“Biwêj (îdyom, îdyomatîk, mantiqê hevokî) pêkhatineke ji gelek peyvan e (‘komek statîka peyvan’) û yekîtîyek e,lê wateya wê ya giştî nikare yekser jî wateya endamên wê yek bi yek were girtin. Ango formekî taybet yê gotinên bi hev re tên bikaranîn e(ku.m.wikipedia.org)”.

“Biwêj; bi wateya xwe ya ferhengî ew peyv an kompeyvin ku kar, rudan û wateyan dihewînin û piranî wateyên mecazî li xwe digirin. Herwiha ew ji bo vegotinê dewlemend û kêş bikin tên bikaranîn (Açar, 2017: 1)”.

“Pênasa biwêjan;

Biwêj komek peyvin ku ji aliyê gel ve hatine pejirandin, pirtirînê wan ne li ser wateyên xwe yên rasteqîn in, di wateyeke mecazî de têne bi kar anîn, jêderka wan nayête zanîn, gelemperîyê nakin û rewşeke cihê îfade dikin (Bingöl, 2014: 6)”

BEŞA DUYEM

2.1. Di Pirtûka Sîberê De Nimûneyên Gotinên Pêşiyan

B

“Bê rehma xwedê çilo ji darê nayê xwarê.”r.16

Malbatên kurd zêde bin fikrên olî de mane.Em vê rewşê wek nimûne di gotinên pêşiyan de jî dibînin.Di vê gotinê de wate ev e ku hemû tişt bi îzna xwedê ava dibe.Bê destûra xwedê û alîkariya wî tiştek ava nabe.

“Bi sebrê mala xwedê ava bûye.”r.146

Di vê gotinên pêşiyan de li ser girîngiya sebrê disekine. Dema ku mirov bisebir bibe tiştên zor û zehmet jî dikare gorî daxwaza xwe ava bike.

D

“Dîwaro,ji te re dibêjim,bûkê tu guhdar be.”r.87

Gotina ne raste rast e.Dema tiştek ji yekê/î re bi rêya îmayê tê gotin ev gotina pêşiyan tê bikaranîn.

H

“Hînkiriyan hîn neke,lê gava hîn dikî,ji bîr neke.”r.112

Mebest ji vê gotinê ev e ku;wexta ku mirov tiştek ji yekê/î re dihewisîne dibe ku rojek ew tişt bi nîyeta nebaş derkeve pêşiya mirov.Bo wî divê mirov tiştên xwe yên ku ji derdorê re gotiye ji bîr neke.

J

“Jin jî hene, jinkok jî hene.”r.19

Li vir jinê jêhatî,bi esl û kok wek ‘jinkok’ hatiye binavkirin. Yanî; jinên bê esl û kok jî hene ku ji wan re dibêjin jin lê yên din jî hene dibên jinkok.

M

“Meriv dewê xwe yî ceribandî nade bi mastê xelkî yî neceribandî.”r.31/104

Tiştên ku aîdê mirov in biqîmettir e. Tiştên mirov çiqas nebaş be jî ji yên xelkê çêtir e.

“Meriv ji nîvê rê jî bizivire, ne yî poşman e.”r.45

Dema mirov xetakî kir divê mirov wê xeta xwe nedomîne.

2.2. Di Pirtûka Sîberê De Nimûneyên Biwêjan

A

“Agir bi dil ketin”r.7

Ev biwêj bo ser meselekî xemgînbûn,elemekî mezin his kirin tê bikaranîn.

“Agirê we de dişewite”r.105

Dema ku ser xeta yekê/î kesên bêsûc û guneh zerarê dibîne ev biwêj bo vî rewşê te bikaranîn.

“Anîn ser rê”r.18

Jibo kesên ku xwediyê fikir an tevgerekî xelet in li wan ji xeletiyê vegerînê tê bikaranîn.

“Anîn ser ziman”r.14

Behsa meselekî an mijarekî kirin.

“Aş bi xeyalekî, aşvan bi xeyalekî”r.116

Hemû kes gorî xeyal û daxwazên xwe cuda cuda difikire.

“Ava me di cewekê re naçe”r 115

Ev biwêj bo kesên ku nakin serê hev an ji hevdû heznakin tê bikaranîn.

B

“Barê giran ser milan e”r.35

Ji bo kesên ku mesûlê tiştanin tê bikaranîn.

“Ber çav reş bûn”.r.126

Bo kesên ku qîmeta xwe wenda dikin tê bikaranîn.

“Ber dil de hatin”r.39/68

Bûyerek an meseleyek beriya agahdar bûyinê his kirin.

“Ber xwe ketin”r.49/69/126

Ber sedemek an tiştek fedîkirin an poşmanbûn e.

“Berfa yekşevî”r.7

Ev biwêj bo pakbûn,tezebûna tiştek tê bikaranîn. Di wateya rast de jî berfa herî paqij û sipî berfa roja ewil e.

“Bi dil nebûn”r.14

Bo tiştên ku nayên ecibandin tê gotin.

“Bi guhê xwe bihîstin”r.34

Bo raste rast şahîdbûna meseleyek tê gotin.

“Bidin ber xatirê min”r.17

Di civaka kurdan de xatir,qedir û qîmet rêmanên girîng in. Em li vir jî dibînin ku ji meseleyek an munaqaşayek an de’wayek bo kesên navbeynkar derbasbûn e,dev jê berdan e.

“Bikevim çeneyan”r.45

Ji bo axaftina nepêwist tê gotin. Wek leq leqa bîla sebeb e.

“Bin pozê de mirtemirt kirin”r.26

Dema ku hin tişt bi dilê yekê/î nebe wek bêdeng ber xwe de diaxive. Ev gotin jî bo vê rewşê tê bikaranîn.

“Bîne rayê”r.107

Li kesên ku di nav xetayek de ye li wê/î ji wê xetayê vegerendin e.

“Bin pê kirin”r.66

Dijî tiştek tevgerîn,xira kirin an îhlal kirine.

“Birîna qelen”/ “Qelen birîn” r.18

Dema malbatek keça xwe bide mêr hin daxwazên wan ji wê malbata ku keça xwe didinê dibe. Ev dirav an jî diyarî dibe. Wek dayîna qîzê tê pejirandin.

“Bu benîşt bi min ve zeliqî”r.116

Pêşiya yekê/î bernedan, jê dûrneketin e.

“Bû qîr û sîr”r.138

Museletê yekê an tistekî bûn.

“Bûn agir bi hev ketin” r.103

Bo munaqaşaya navbera du kesan îfade dike an jî wateya lihev xistina kesan jî dide.

Ç

“Çar qulbên dinyayê”r.66

Bo hemû aliyên cîhanê tê bikaranîn.

“Çav li rê bûn”r.95/123

Li benda kesek an hêviya tiştek bûyin e.

“Çavê min li wan ket” r.7

Di ber çav de derbasbûn, li yekê/î bêhemdî dîtine.

“Çavê me ronî” r.24

Ji bo tiştek xweş ku li mirovan bextewar dike wek pîrozkirinê tê bikaranîn.

“Çavê min birjîn” r.138

“Çavê xwe rijandin” r.6/36/71

Wek nifir e. Wexta yek xetakî bike wek gotina çavê tw derkeve tê bikaranîn.

“Çavê xwe bi yekê/î qurpandin” r.8

Gelek wateyên vê gotinê heye ku di pirtûkê de wek tiştek qebulkirin tê bikaranîn.

“Çavên xwe gerandin” r.23/91

Bi baldarî tiştek gerîn an nêrîn.

“Çi bû, çi çû” r.66

Bo tiştên ku êdî mirov nikaribe bo wî tiştek bike tê bikaranîn. Wek “olan oldu,biten bitti” ya tirkî ye.

D

“Derî li wan vekirin” r.83/124

Li cihêk an malbatek ziyaret kirin e.

“Dest dayîn”r.10/53

Alîkariya yekê/î kirin e.

“Dest jê nebûn” r.55/147

Wexta ku mirov naxwze ji kesek dûrbikeve an dev ji tiştek bernede ev gotin tê bikaranîn.

“Destê te nediçûyê” r.45

Heyfa xwe li tiştek anîn e.

“Devê min hat girêdan” r.32

Li hemberê bûyerek bê reaksiyon mayîn e. Tu tiştek negotin e.

“Devê xelkê girtin” r.18

Li ser meseleyek îzna axaftina kesan nedayin e.

“Deynê stûyê min be” r.24

Ji tiştek li xwe berpirsyar dîtin e.

“Di agirê wê/î de şewitîn” r.116

Ser xeta an sûcek yekê/î zerar dîtin e.

“Di ber xwe re çûyin” r.78

Ji ber sedemek fedî kirin.

“Di cî de sar bûn” r.45

Li hemberê bûyerek an tiştek şaşmayîn, ecêbmayîn e.

“Di çav de anîn” r.55

Li yekî ji ber sedema tevgera wî poşman kirin e.

“Di guhê gê de bûyin” r.25/34

Dema xebera mirov ji tiştek tunebe an ji meseleyek hayîdar nebe ev biwêj tê bikaranîn.

“Dil jê nexweş bûn” r.67

Ji yekî dilmayîn an ji yekî heznekirin e.

“Dil şewitîn” r.69/106

Li ber yekî ketin, bo yekî xemgîn bûn. Berketina bûyerek an rewşek.

“Dil şikandin” r.27

Vê gotinê bo kesek kesirandin an xemgînkirinê tê bikaranîn.

“Dil rehet bûn” r.24/29/42

Xweşî, rihetî, saxiya dil ji hundir ve bêxem bûyin e.

“Dilê xwe de gotin” r.29/124

Di hundirê xwe de gotin an em dikarin bêjin ku fikir û ramanên ku bi tu kesî re nayê parî kirin.

“Dilê xwe li ber hev vekirin” r.8/87

Di navbera du kesan de fikir û ramanên ku hîs dikin bi hev du re parî kirin e.

“Dilè xwe rehet kirin” r.124

Li xwe ji xemgînî an bêhizuriyê xelas kirin e.

“Dilsoz” r.6/12

Bo kesên pêbawer an rastgo tê bikaranîn.

“Dil şewat bûn” r.7

Bo kesên dilsoj, kovan tê bikaranîn ku ji ber derdên kesì xemgîn dibin.

“Dilteng bûn” r.7/92

Li hemerê tiştek bêtehemul bûn e.

“Dinêdîtî” / “Dinya dîtî” r.12/41

Bo kesên ku haya wan ji hemû tişt hete tê bikaranîn, kesên zana re tê gotin.

“Dinya wekî tara bêjingê li dora wê geriya” r.123

“Du halanî” r.97

Ev gotin bo jinên hemle tê bikaranîn.

“Dûr be” r.14

Ji bo tiştek xirab ku mirov naxwaze bê serê mirov tê bikaranîn wek xwe ji xirabiyan parastin tê gotin.

E

“Em li ku hûn li ku” r.10

Ev gotin bo qiyasa navbera du kesan an jî du malbatan tê bikaranîn ku yên ku ev biwêj bikartînin baştirbûna xwe dixwazin nîşanê yên hemberê xwe bidin.

“Ez li mala xwe, tu li mala xwe” r.46

Ev gotin di wateya kes eleqe kar û xebata kesê din neke tê bikaranîn.

“Ez heft rojan bikevim ber ruh” r.96

Di vê gotinê de wek ku kes ji xwe re nifir dike ku wexta kesek dimire bi rehetî ruhê xwe teslîmê xwedê nake û ezab bikşîne.

“Ez di bextê te de me” r.129

Wek rica kirin tê bikaranîn. Bang li wijdan û rehma hemberê xwe dike ku daxwaza wê/î bîne cih.

“Ez xulamê we me” r.52

Ji kesek re wel lavakirin tê bikaranîn. Mexsed livir xwe wek di asta koleyê yekî qebûl dike an wisa nîşan dide.

G

“Gotina tal” r.29

Jibo gotina nexweş tê bikaranîn.

H

“Halê wê xweş bû” r.36

Ev gotin zêdetir bo kes an malbatên ku ji aliyê aborî ve rewşa wan baş e tê bikaranîn.

“Her yek kurê bavê xwe ye” r.90

Qîmet û girîngiya hemû kesan heye ku kes ji kesî çêtir an biqîmettir nine.

“Hesret kişandin” r.6

Bêriya kesek an tiştek kirin.

“Heyfa xwe bi yekê anîn” r.35

Ev biwêj bo ber yekê ketinê an gunehê mirov bi yekî bê tê gotinê.

“Hêviya xwe birîn” r.30/35/123

Êdî li benda kesek an tiştek nebûn, li benda tiştek nebûn înanca bûyina tiştek wenda kirin.

“Hûn kêr, em penêr” r.18/19

Di pirtûkêde ev biwêj bo birîna qelen yanî qelenbirîn tê bikaranîn.

J

“Ji dest çûyin” r.72

Tiştek wenda kirin an derengê tiştek mayin.

“Ji dest hatin” r.24/33/40

Xwediyê merîfet bûn ku tiştên ku bi hêza xwe an bi eqilê xwe mirov karibe bike.

“Ji dest nehatin” r.7/35

Ev biwêj beyîniya “ji dest hatinê” ye.

“Ji dil hatin” r.35

Tiştên ku em bi samîmiyet û bi daxwaza xwe dikin.

“Jimalderxistin” r.25

Ev biwêj bo roja nîşaniya keç û xortek tê bikaranîn.

K

“Kafirstanî ye” r.71/145

Peyva kafir bo kesên ku bêdîn in û xwedê nasnakin tê bikaranîn. Biwêja kafirstanî ji bo cihên ku mirov di eziyet û nesaxiyê de ye tê bikaranîn.

“Kenê wî li ber girî bûn” r.54

Kenên ne ji dil ku rastiyê de kesên ku xemgînin bi kenên xwe elemên xwe vedişêrin.

“Ker guraye, maye poçik” r.26

Gurandin di wateya ferhengî de çerm ji ser laşê heywanekî rakirin e. Yanî di vê biwêjê de dixwaze bê gotin ku dibê hemû tişt derbas bû hê tu li pay tiştên biçûk î. Wek biwêja “ avê aşê biriye, em jî çemçeqûnê digerin” e.

“Kes nabêje dewê min tirş e” r.79

Tu kes li ber mirov li xwe xirab nîşan nade. An nebaşiyên xwe ji mirov vedişêre.

“Kete nava êgir” r.136

Bo kesên ku dikeve nava rewşek xirab tê gotin.

“Ketine ber bayê wan” r.65

Di bin bandora kesek an rewşek de mayîn.

“Ketiye zikê diya xwe” r.119

Vê gotinê bo kesên ku rewşa jiyana wan pir baş bûye tê bikaranîn.

“Kêf pê hatin” r.9

Bi rewşek an bûyerek kêfxweş bûyin.

“Kul û derdên xwe rêtin” r.114

Ev gotin bo êş û keserên dilê xwe bi yekê re parvekirin e.

L

“Layiqê wê/î ye” r.19

Hejayî tiştek bûn.

“Li ser zaran bûn” r.75

Bo kesên ku der dorê de li ser zêde tê axaftin tê gotin.

“Lingê xwe bi lingê wê/î re avêtin” r.19

Wateya vê gotinê gorî kesek tevgerîn e.

“Lingê xwe daye erdê” r.14/119

Ji daxwaz û fikrên xwe venegerîn e.

M

“Mal ava be” r.12/27/60

Wek dua tê bikaranîn ku di wateya spas kirin, bo temenîyên baş tê bikaranîn.

“Malderxistin” r.43

Ev gotin bo nîşan kirina keçek û xortek tê bikaranîn.

“Mala min şewitiye” r.87

Ev biwêj bo bela û tofanê ku tên serê mirov tê bikaranîn.

“Mala te xana xwedê be” r.78

Wek dua, temenîyên baş tê bikaranîn.

“Malê dinê” r.24

Ev biwêj bo hebûn û serweta dinyevî yanî îro heye sibê tune tê bikaranîn.

P

“Patika stûka xwe xurand û çû” r.55

Ev gotin wek destê vala vegerîn e. Yani tiştê ku bidest dikeve tune.

“Peyv di dev de girtin” r.19

Axaftina yekê birîn e, îzna axaftina yekê nedayîn e.

“Pêsîra xwe ji dest xilas kirin” r.31/119

Ji xişma kesek xelas bûn, ji yekê filitîn.

“Pişt guhê xwe de avêtin” r.28/29/92/107

Tiştek re girîngî nedayin e. Li ser tiştek nesekinîn û di hişê xwe de negirtin e.

“Pişta xwe bi min girê da” r.147

Ev biwêj di wateya bi yekê bawer bûn û hêviya alîkariya yekê bûn tê bikaranîn.

“Pizika ser ziman bûn” r.112

“Poz pê nekirin” r.52/81

Tiştek ne ecibandin.

“Pozbilind” r.6

Bo kesên qurre, bixurur tê bikaranîn.

“Pozê xwe bikî nav karê me” r.23

Ji bo kesên ku li xwe bêhewce dahîlê karek, meseley dikin tê bikaranîn.

R

“Rehme li bavê te” r.23

Ji bo mezinê kesan wek daxwazên baş û dua tê gotin.

“Rêya te vekirî ye” r.39

Vê gotinê bo kesên jîr û jehatî kû dê xebatên baş bikin tê bikaranîn.

“Rêya malê dayîn” r.16

Bo kesên ku dema diçin ji malbatek keçikek dixwazin destûra wan a hatina malê dayîn e.

“Rêyek dayîn ber xwe” r.23

Ji bo xwe armancek diyar kirin e.

“Ruhê wê anî serê poz” r.103

Ji ber zilm û zordestiyê yekê aciz kirin.

“Rûreş kirin” r.66

Li yekê şermandin e.

“Ruyê xwe qalin kirin” r.116

Bo kesên ku bêşerm û fedî ne tê bikaranîn.

“Ruyê xwe tal û tirş kirin” r.6/64/120

Li hemberê bûyerek an meseleyek ku bi mirov xweş nayê xwe aciz kirin e.

S

“Sebra xwe pê anîn” r.12/44

Ji yekê teselî girtin.

“Ser çavan” r.52/64

Bersiva erêniyê ye û bersiva silav dayinê tê bikaranîn.

“Ser serê min re hatin” r.129

Dema ku yek diçe mala kesek ev gotin tê bikaranîn û wek îzahkirina bextewarbûnê ye ku li hemberê kesên ku hatine mêvaniyê tê gotin.

“Ser tayê yekê ve çûyin” r.67

Gorî daxwazên yekê hereket kirin.

“Serê wî bixwe” r.45

Wek nifir an diyarkirina dilmayinbûnê tê bikaranîn.

“Serî hetanî lingê” r.37

Di wateya hemû, tev de tê bikaranîn.

“Serî lê xistin” r.38

Bo ziyaret kirinê tê bikaranîn.

“Serjinik” r.20/29/47/81

Ev gotin ji bo mêrên ku wek jinan tevdigerin, difikirin û eleqedarê hemû tiştan dibin tê gotin.

“Sêva devê wan nebûn” r.7/49

Li yekê layiqê kesê ku hemberê wî ye nedîtin.

“Sibê li ku, nîvro li ku” r.92

Ji tiştek derngmeyinê îfade dike.

“Stûyê xwe xwar kirin” r.7

Ji sedemek xirab perîşan bûn û bê daxwaz ji mecburîyetê tiştek qebulkirin.

T

“Te kêr lê xista dilopek xwîn jê nedihat” r.100

Ev biwêj ji ber rewşek matmayinê îfade dike.

“Textên we textên şayîyan be” r.27

Ji bo kesek dua kirin û daxwazên başiyê tê gotin.

“Tû kir û di pişt re ew tûka xwe alast” r.30

Bo kesên ku ji xeber û soza xwe vedigerin tê bikaranîn.

2.3. Di Pirtûka Kurdê Rêwî De Nimûneyên Gotinên Pêşiyan

B

“Bavê te çi bû, wekî tu çiv î.” r.25

Wateya vê gotinê mezinê mirov çawa be mirov jî wisa dibe. Mebest li vir ev e ku; pêşiyên mirov heke baş nebin mirov jî wek wan nebaş dibe.

“Ber bi devê kelbekî heram nave.” r.84\r.141

Di vê gotinê pêşiyan de wate ev e; qencî bi xirabiyên biçûk ji holê ranabe.

“Ber bi kulmê kîne –kînê te’l nave.” r.16

Başiya mirov heke zêde be, xirabiyên biçûk çiqas hebe jî xirabiyên biçûk nikare zerarê bide wan başiyên mezin.

“Berxê nêr xwedê daye seva kêrê.” r.100

Hemû tiştên ku hene gorî taybetiyên xwe têne bikaranîn. Sedema hebûna her tişt û herkesê heye.

“Bet çiqasî kok dibe, paşla wî ewqasî teng dibe.” r.21

Heke mirov aqilmend nebe, bi gotinên tewş mirov li xwe bêwar dihêle.

“Bi pirsê meriv diçe qursê.” r.110

Heke mirov dixwaze tiştek hîn bibe divê mirov ew tişt bi pirsê bibîne. Mirov dikare bi riya pirsê bigihêje hemû tiştan.

C

“Cim’et hûkî dike mûkî.” r.41

Li ser bihêzbûna cim’etê disekine ku cim’et dikarê tiştên mezin jî bêqîmet, bêdeger bike.

“Çiya rastî çiya nayên, meriv rastî meriva tên.” r.166

Mirov wekî çiy adi cihê xwe de sabît ninin, mirov dikare di jiyanê de rastî hevdû bê.

“Çiyayê bilind ji cînarê xirav paktir in.” r.53

Kesên baş ku di dûrê me de ne ji kesên xirab ku di nêzê me de ne baştir in.

D

“De zanibe, kî berx e, kî beran e.” r.18

Di vê gotinê de dibêje ku divê mirov zanibe kesê bihêz kî ye. Berx sembola bêhêziyê ye beran jî bihêzbûnê sembolîze dike.

“Deng ji kevir bê ji wî/wê nayê.” r.100

Wexta mirov li hemberê kesek an bûyerek bêdeng bimîne, tu peyv ji devê mirov dernekeve ev gotin tê bikaranîn.

“Dengê defê dûr va xweş tê.” r.132

Titşt dema dûrê mirov bibin xweş xuya dikin lê dema ku mirov dema ku nav wê tiştê dur de bibe dibîne ku ew tiştê ku dûrve b ime xweş dihatin rastî de wisa xweş, baş nine.

“Destê tenê deng jê nayê.” r.120

Mirov dema tenê be hêza mirov tune lê dema mirov wek komek bibe dikare dengê xwe geş bike û daxwazên xwe hêsantir bîne cih.

“Dew xwestin, kodik veşartin.” r.113

Mirov dema tiştek dixwaze bibe dudil bimîne ev gotin tê bikaranîn ku wek ku wê tistê dixwaze lê bo diêtiya wê tiştê keda wî/wê tunebe.

“Dinya ê mîna wan ra jî nemîne.” r.84

Dinê cihekî demborî ye. Hemû fanî rojek dimirin. Bo wî mirov xirab be jî baş be jî rojek dimire. Mebest li vir eve ku helbet rojek heyfa kesên hejar ji kesên zordest dê bê girtin.

“Dinya serdapê xirav bûye.” r.151

Mirov bo tiştên vala, bêwate di navbera hev de nebaşiyê derxistine.

E

“Ecelê bizinê tê diçe nanê şivên dixwe.” r.183

Hin kes bixwe dibine sebebê xwe.

G

“Gereke meriv baxê xwe av de, lê paşê ê xelqê.” r.61

(Ev gotin ji gotinên pêşiyan ên ermenan e.)

Divê mirov pêşî li xwe bifikire paşî kesên din bifikire. Yanî divê pêşî mirov qîmetê bide xwe paşê bide yên dora xwe.

“Giha ser koka xwe şîn dive.” r.141

Eslê mirov çi be mirov jî ew e.Mirov mezinên xwe bo xwe mînak digire û wek dibêjin damar dikşîne em dikarin bo vê gotinê bêjin.

“Golikê malê ji gayê malê natirse.” r.97/r.171

Mirov ji kesên ku nas dike natirse lê ji kesên biyanî zêdetir ditirse.

H

“Hevîrê gele av dikşîne.” r.135

Heke mirov deme ku karek bike vasitayên xwe ji tiştên baş hilnebêjêre helbet dê tengasî jî derkeve holê.

“Hevraz tu kim simêl in, berjêr tu kim rû ne.” r.56

Li hemberê bêrêbûnê ev gotin tê bi kar anîn k udi vê rewşê de mirov çawa bike nizane û çawa bike rast, baş nabe. Wek gotina ‘navbera Xelîl û Celîl de mame’

J

“Ji dê û bavan hezar tûk dikevin.” r.91

Ev gotin wek gotina ‘Hemû bêçiyên dest cuda ne’ ye. Dê û bavê mirov yek be jî hemû xwiş û bira ji hev cudatir in.

Ji nêrî gulmastê çê kirin.” r.80

Dema mirov nexwaze tiştek bike, ew çax hemû tiştan bêçare dike. Yan jî bixwaze ew tişt bike ji tiştên ku bêîmkan be bi îmkan dike.

K

“Kevirê binê bîrê jî bivîne.” r.106

Divê mirov tenê tiştên ku xuya dike mêze neke. Divê mirov ji hemû aliyan ve tiştan binêre.

“Kê derê de zirave bira wir da jî bişkê.” r.31

Wexta ku mirov ji tiştekî derbas dibe, êdî devjê berdide ev gotin tê bikaranîn.

“Kurmê darê ne ji darê ye.” r.105

Divê mirov hemû pirsgirekan ji yekê nizanibe. Çimkî kurm wek teswîra xirabiyê hatiye bikaranîn lê aîdê darê nine. Têkiliya hin tiştan bi hev ve girêdayî xuya bike jî carna rastî wisa nine.

L

“Lingê pêxasa timê ber derê soldirûya ne.” r.142

Kesên ku pêdivîya wan bi tiştek hebe her tim ber cihê ku wê tiştê tê firotinê ye.

“Lingê xwe ji bera bavê xwe dirêjtir neke.” r.76

Divê mirov tevgera xwe gorî rewşa xwe bike. Ev ji aliyê aborî ve jî wisa yê ji aliyê tevgera civakî ji wisa ye.

“Lingê xwe ji orxana xwe dirêjtir neke.” r.54

Wek gotina jorîn e ev jî; divê mirov ji xwe hayîdae be gorî wê pêwistiyên xwe çareser bike.

“Lingê xwe weke lihêfa bavê xwe dirêjke.” r.18

Divê mirov gorî rewşa xwe tevgere.

M

“Mala me xirav nabe, mala zêra xirav dibe.” r.38/r.134

Yên ku dewlemend ninin tiştên ku wenda bikin jî tune.

“Malê dinê qirêca destan e.” r.18/r.118

Dinê ji bo ku nemayînde ye, t,ştên ku em îro xwediyê wan in sibê dema ku em dimirin êdî xwedîtiya me ji holê radibe. Dewlemendî tiştekê payîdar nine.

“Meriv wexta tasa ava sar ji kanikê vexwar wê tucar bîr nake.” r.

Mirov dema ku qenciya yekê bibîne, an jî şahidê tiştekê qenc bibe ew tişt qet jibîr nake.

“Mezina ra mezin, çûka re çûk be.” r.63

Divê mirov ji zimanê herkesê fêm bike. Divê mirov bi her kesê re gorî wan têkilî deyne.

“Mêr dimire, nav dimîne.” r.167

Kesên ku egîd û mêrxas be bimire jî bi qenciya xwe nayê jibîr kirin.

“Mişk çiqasî xwelî bikole, wê ewqasî serê xwe ke.” r.29/r.95

Mirov çiqas xirabî bike ew xirabî disa zirarê dide mirov.

S

“Se goştê sa naxwin.” r.111

Kes zerarê nadin kesên wek xwe.

“Ser enîya meriv çi hatiye nivîsarê wê usa jî bive.” r.56

Qedera mirov de çi hebe, pêşerojê de jî ew derdikeve pêşiva meriv.

“Serê nîvaçîtiyê timê dişkê.” r.105

T

“Tu çiy î, wekî qîza(layê, bavê…) te çi ve.” r.42

Mirov dişibe malbata xwe. Heke xirab be, ku ıi vir di wateya xirabî de hatiye bikaranîn, yên ku ji malbata mirovin jî xirab tê qebûlkirin.

“Tu ku va hiryayî, ku va diryayî.” r.41

W

“Wextê ga têr dixwe, stûyê xwe li kendala radide.” r.54

Kesên ku wexta dewlemend dibin êdî nizanin çi bikin.

“Wextê ecelê bizinê tê, diçe nanê şivên dixwe.” r.107

Hin kes bi xwe dibine sebebê mirin, xirabî hwd. ya xwe.

X

“Xulam bindest, torîn serdest nebin.” r.60

Di vê gotinê pêşiyan de îşaretê pirsgirekêk civakî dike ku di navbera axa û xulaman de serdestî û bindestî nîşan dide. Dibêje; yên ku xulam in her gav di bin destê axa û began de dipelçiqin.

“Xuna me ji ya xelqê sortir nîne.” r.15

Yek ji yekê biqîmettir an hêjatir nîne.

“Xwedê berxê nêr daye bona kêrê.” r.64

Di dinê de wezîfeya hemû tiştan hemû kesan cuda ye. Sedema hebûna hemû tiştan heye.

Z

"Zikê têr hace zikê birçî tune." r.73

Kesên ku rewşa wan baş eji kesên ku rewşa wan xerab e bêxeber in.

"Zimanê şîrîn me'ra ji qulê derdixe, rêwiya ji rê vedigerîne." r.107

Wexta ku mirov bi zimanekî baş û şîrîn biaxive dikare hemû daxwazên xwe bi wan kesan bide qebulkirinê.

2.4. Di Pirtûka Kurdê Rêwî De Nimûneyên Biwêjan

A

"Alî kirin" r.155

Ji bo alîkariya kesan kirinê tê bi kar anînîn.

"Agir mala te bikeve" r.74

Wek nifir tê bi kar anîn. Ji bo însanan di dinê de di tiştên dinyevî de tiştê herî biqîmet mal e wek tu bê mal bibînî tê gotin.

"Aqil birîn" r.57/r.135

Wexta tişt bikeve hişê mirov vê biwêjê tê bi kar anîn. Tiştên ku gorî mentiqa mirov dibêtiya wî heye.

"Aqil unda kirin" r.136

Dîn bûn, hişê xwe wenda kirin.

"Av hestûyê hev da vexwarin" r.167

Bo samimiyata di navbera kesan tê bikaranîn.

"Avê destê wî/wê nekirin" r.104

Bo kesên ku baş in ku yek nikare bigihêje wan tê bi kar anîn

B

"Benîşta devê xelkê bûyin" r.149

Ji bo kesên ku zêde qala wan tê kirin tê bi kar anîn. Kesên ku zêde li ser zar û zimanan in re tê gotin.

"Benîşta devan bûyîn" r.34/r.130

bnr. Benîşta devê xelkê bûyîn.

“Ber çe’va reş bûn” r.55

Ji bo kesên ku êdî xwediyê qîmeta berê ninin re tê gotin.

“Ber çe’va da bihûrîn” r.145

Bo tiştên ku mirov bi taybetî mêze nake lê çavên mirov lêdikeve tê gotin.

“Ber çe’v da derbas bûn” r.109

Tiştên ku bê bîra mirov wek filîm di ber çavê mirov de derbas dibe.

“Ber çe’v da reş kirin” r.102

Li kesek ber yekê din xirabkirin e.

“Ber dilê wî/wê da hatin” r.112

Bo tiştên ku bi me ‘eyan dibe yanî em hîs dikin tê gotin.

“Ber tiştekî hesav kirin” r.54/r.164

Bo meseleyek an tiştek ji fikrê kesekê re qîmet dayin.

“Ber xwe da gotin” r.149

Tiştek bi dengekî nizim gotin e.Li hemberê meseleyek bê hizûrî heye lê wê meseleyê ji yekê re na bi xwe bi xwe gotin e.

“Ber xwe ketin” r.150/r.160/r.194

Bo meseleyek an bûyerek şerm kirin an jî xemgîn bûnê tê bi kar anîn.

“Bîn fire bûn” r. 166

Bo kesê ku zû zû li xwe bo tiştek te’l nakin tê gotin. Kesên ku bi sebrin.

“Berxê salekî bûn” r.54

Bo biçûk bûn an teze bûnê tê bi kar anîn.

“Bi çe’vê xwe dîtin” r.154

Bo bi xwe şahid bûnê tê bi kar anîn.

“Bi serê xwe bûn” r.60

Bo kesên ku bi kesekê ve girêdayî ninin biryarên xwe bi xwe didin tê bi kar anîn.

“Bin çe’va da nihêrî” r.79/r.108

Ne ‘eşkera mêze kirin e.

“Bin lêva va kenîn” r.122

Kenînekî bi kînaye û veşartî ye.

“Binê çe’va da avûr dayîn” r.54

Dîsa ne ‘eşkera nihêrîn e.

“Binê yolê” r.57/r.69

Bo kesên ku rewşa wan a aborî xirab bûye tê bi kar anîn.

“Beşer ser lêv sar bûn” r.116

Dema cihê kenînê şaş mayîn an mat mayîn digre ev biwêj tê bi kar anîn.

“Bîna wî/wê derketin” r.107

Bo dil fireh bûnê tê gotin.

C

“Canê te xweş be” r.107

Bo tiştekî nemuhîm tê bi kar anîn. Wek canê te sax be ye.

Ç

“Çe’v da mayîn” r.151

Bo daxwazên ku nehatine cih tê bi kar anîn.

“Çe’v gerandin” r.117

Tiştek di ser da nihêrîn. Bi baldarî mêze nekirin e.

“Çe’v ronî kirin” r.55

Ji bo tiştek xweş û mirovan bextewar dike pîroz kirin e.

“Çe’v li destê qelkê bûn” r.146

Benda alîkariya kes an kesan bûyîn.

“Çe’v quncirandin” r.113

Hereketek wisaye kut tê gelek wateyan hin ji wan; çawayî, çi dikî,ji cinsîyeta din re ecibandinê diyar dike an dema tiştek nayê teswîb kirin ji kesê sêyem re ev hereket tê kirin.

“Çe’vê te birje” r.68

Wek nifir e.Wexta yek xetakî bike wek gotina çavê te derkeve tê gotin.

"Çe'ê xwe vekirin" r.56

Bo ne xapandinê tê gotin. Bo baldar bûnê tê gotin.

"Çi li dest tê" r.56

Bo bêçaretî an dema mirov nikaribe meseleyek çareser bike ev biwêj tê bikaranîn.

D

"Da binê pê xwe"r.44

Tiştên bi qîmet bê qîmet kirin e.Bi tiştekî nehesab kirin e.

"Deng ji kevir hat, ji wî/wê nehat" r.117

Bo bêdeng mayinê tê bi kar anîn.

"Dengê xwe birîn" r.129

Titek negotin, xeber nedan, bêden mayin, axaftina xwe berdewan nekirin.

"Derzî bavêjî nakeve erdê" r.20

Ji bo qelebalixa zêde tê gotin.

"Dest dane destê hev" r.49

Alîkariya hevdu kirin, yekbûn e.

"Dest jê kişandin" r.121

'Eleqa xwe birîn, êdî 'eleqedar nebûn.

"Dest ji hev berdan" r.180

Dema îttîfaqa kesan ji hev tê birîn ev biwêj tê bikaranîn.

"Dest xistin" r.147

Gihiştina tiştek an armancek e.

"Devê bavê te/we/wan neketiye" r.57/r.162

Ser tiştek wexta heqê axaftinê mirov nebîne û nede kesê ev biwêj tê bi kar anîn.

"Devê xwe bida ber devê wî/wê" r. 69

Xebera xwe yek kirin, ji aliyê ramanê ve nêzê yekê bûn.

"Devê wî/wê nihêrîn" r.82/r.156

Gorî yekê tevgerandin.

"Dewlet serê te" r.68

Bo daxwaza dewlemend bûn, bihêz bûnê tê bi kar anîn.

"Di fikir da derbas bûn" r.146

Tiştên ku di hişên mirov de derbas dibe. "

"Dibû qîr û sîr" r.43

Bi seba tiştek hêrs bûn. "

"Dil dayîn" r.129/r.185

Ji mirovek heskirin an evîndar bûn.

"Dil dilsotin" r.139

Ji dil ve êşandin, xemgîn bûn.

"Dil jê nexweş bûn" r.91

Ji yekê dilmayin an heznekirin.

"Dil rehet bûn" r.169

Xweşî, rihetî, saxîya dil ji hundir ve bê xem bûyin.

"Dil şewitîn" r.96

Li ber yekê ketin, bo yekê xemgîn bûn. Gunehê mirov bi kesek an tiştek hatin e.Berketina rewşek an bûyerek e.

"Dil tijî bûn" r.144

Li hemerê kesek an tiştek tehemûla mirov nemayîn e.

"Dil û hinav di dev da hatin" r.169

Ji tiştek tirsîn an qurfîn e.

"Dil xirav bûn" r.91/r.162

Bo tiştek xemgîn bûn, pê êşîn e.

"Dilê xwe da gotin" r.108/r.150

Di hundirê xwe de gotin an em dikarin bêjin ku fikr û ramanên ku bi kesê re nayê parî kirin.

"Dilê xwe da hesav kirin" r.65/r.126

Di hundirê xwe de bazariya tiştan kirin e.

“Dilê xwe da şa bûn” r.140/r.150

Ji hundirê xwe ve bextewar bûn e.

“Dilê xwe li ber hev vekirin e.” r.49

Hundirê xwe ji hevdu re vekirin e.Tiştên k udi hundirê mirov de derbas dibe bi hevdu re parîkirin e.

“Dinê ‘elam pê hesandin” r.59

Hemû kesan ji meseleyek hayîdar kirin e.

“Dor nedan” r.152

Bor rêz, qor nedanê tê gotin.

“Dûrî pêsîra min ve” r.40

Bo ji xwe dûr girtinê tê bikaranîn.

“Dudilî bûyîn” r.85

Di naverê de mayin. Wek mirov nikaribe qirara tiştek bigire.

“Dûrî aqilan” r.57

Tiştên ku nakeve serê mirov, derveyê mantiqê ye.

“Dûrî xeberdanê” r.66

Derê sohbeta xwe girtin daxwaza ji gotinên xirab li xwe parastin heye.

“Durûtî kirin “ r.152

Bo kesên ne durust tê bi kar anîn.

E

“Ecêvîk anî serê wî/wê” r.57

Bo tiştên ku sosret in û tên serê mirov tên bi kar anîn.

“Eme ne xam in” r.113

Bo kesên ku sist ninin û saf ninin tê gotin.

“Emrê xwe dayîn” r.85

Hemû jiyana xwe bo kesek an tiştek xerc kirin.

“Erd û ezman bûbûne yek” r.65

Bo qiyametê ev biwêj tê gotin ku, tevlihevî û pirsgrêkan îfade dike.

“Eşq difire dilê meriva” r.112

Bo evîndar bûnê tê gotin.

“Ewî/ewe bîne yolê” r.172

Kesên ku rewşa xirab an din av xetayek de ye li wî/wê rast kirin e ji rêya xirab vegerandin e.

F

“Fikra wan ra jî derbaz nebûn” r.120

Bo tiştên ku qet nayê mîra mirov tê bi kar anîn.

“Firî dilê wî/wê” r.142/r.145

Tiştên ku dikeve dilê mirov, di hêstên mirov de cih digire.

G

“Guh dayîn” r.190

Meseleyek an gotinek bo baş fêm kirinê guhdarî kirin e.

“Guhê gê de razayî bûn” r.120

Bo kesê ku ji tiştan bêxebere tê gotin.

“Gunê we stuyê we” r.43/r.123/r.153

Li xwe ji tiştek berpirsyar qebûl nekirin. Mesûliyetê ji xwe derxistin.

H

“Halê hev da kewgirî bûn” r.49

Din ava xe de xemgîn bûn ku haya kesê pê tunebe.

“Hatina ber çe’v” r.179

Bo nezer bûnê tê gotin.

“Herê kirin” r.117

Di adetên kurdan de dema qîz didin piştê xwestinê wek qebûlkirina qîz dayinê bi biwêja herê kirinê tê îfade kirin. Lê di wateya fireh de tiştek an meseleyek qebûlkirin e.

“Hesav dîti” r.60

Bo kesek cezakirinê tê bikaranîn.

“Hêrsa mirov rabûn” r.118/r.144

Ji tiştek acizbûn an ji kesek re sû bûn.

“Him ne’lê dixî, him bizmêr” r.69

Alîgirê herdû aliyê dijê hev bûn. Wek alîgirê du fikrên dijî hev bûn.

“Hurmetê ra lîstin” r.150

Li kesek bê qedir, bê qîmet kirin e.

“Hûk kiribû mûkî” r.111/r.167

Tiştekî biçûk mezin kirin e.

J

“Jê xilaz bûn” r.58

“Ji ber dest xilaz bûn” r.17

Ji tiştek an kesek azad bûnş rizgar bûn.

“Ji destê xwe çûyîn” r74/r.113

Êdî li hember tiştek bêbandor mayîn e.

“Ji dev revandin” r.135

Meseleyek, gotinek xeyr-î îxtiyarî gotin e.

“Ji dinê bêxeber bûn” r.160

Haya mirov jitiştek tunebûn e.

“Ji dinê xwe derketin” r.200

Ew cîhana ku em di xeyalên xwe de diafirînin ji wî derketin bi jiyana rast re rû bir û mayîn.

“Ji hêrsê xeniqîn” r.121

Bo pirr sinêr bûnê tê bi kar anîn.

Ji vir heta mala xwedê neheq bûn” r.75

Ji her alî ve bêmaf bûyin.

K

“Kela wî/wê rabûn” r.137/r.169

Bo tiştek kelecan bûn.

“Ketina zar û ziman” r.64

Ji aliyê hemû kesan kû ew mirov nas dikin, behsa wî/wê bê kirin e.

“Ketime orta du keviran” r.64

Di navberê de mayin e.Biryara tiştek mirov nikare bide.

“Kê ji me serî ye, kî ling” r.111

Di wateya kî ji kî girîntir an bihêztir e diyar bibe tê gotin.

“Kêf kêfa wî/wê bûn” r.109

Bo kesên bextewar tê bikaranîn.

“Kêfa hev ketin” r.118

Li hev xemgîn kirin, bêhizur kirin.

“Kêrî tiştekî nehatin” r.73

Bêwesif bûyîn an bo tu tiştek bisûd nebûn.

“Kî dost, kî dijmin e” r.130

Bo heval û hemberên xwe cudakirinê tê bikaranîn.

“Kulê derdê xwe rêtin” r.71

Êş û keserên hundirê xwe îfade kirin e.

“Kûr û dûr fikirîn” r.50

Li ser tiştek ji her alî ve rawestandin e.

L

“Lalome ser ziman de hatin”r.40

Ev biwêj wek nifir tê bikaraîn. Bo ji yekê xilasbûnê tê bikaranîn.

“Lêvê wî/wê yê jêrîn û jorîn şabûna nediçûne ser hev.” r.116

Bo bextewar bûn û kêfxweş bûnê tê bi kar anîn.

“Li ber çe’v reş bûn” r.182

Kesek an tiştek êdî bo mirov bêqîmet, bêdeger bûn.

"Li rû hev ketin" r.195

Bo li hevdu dîtinê tê bikaranîn. Mirov carna nexwaze li yekê bibîne jî di jiyana hevpar de bê daxwaza mirov bi kesên ku em naxwazin bibînin bi hawayek derdikeve hemberê me.

"Lingê wî/wê ji şabûna erd negirtin" r.43/r.109

Dema mirov zêde bextewar dibe ev biwêj tê bi kar anîn.

"Lingê xwe hildaye ewê jî daniye dewsê." r.149

Dema kesek ji her alî ve bişibe yekê din ev biwej bo kesê ku dişibe tê gotin.

M

"Mala te ava be" r.41/r.113

Bo spas kirinê wek temenniyekê baş tê gotin.

"Mala wî/wê şewitandin." r.134

(Mala wî/wê xirav kirin. r.88)

Ji kesê re zerer dayîn e.

"Mefera wî/wê hatibû birînê" r.147/r.153

Ji tiştek bêhêvî bûyin.

"Merivê xêrê" r.160

Bo kesê baş, kesên ku başî jê tê, tê bi kar anîn.

"Mêvan mêvanê xwedê ye" r.59

Di çanda kurdan de mêvanan re pirr qîmet tê dayîn. Di vê biwêje de jî ev qîmet bi sureta xwedê ve girêdanê tê nîşandan.

N

"Nan û pîvaz tev xwarin" r.61

Bo samimiyeta navbera mirovan tê gotin.

"Nanê xwe genim kirin" r.80

Ji tiştek sûd girtin.

"Nanoziko" r.109

Bi zor û zehmetiyê debara xwe kirin.

"Nava dişurmîşbûnê de mayîn" r.145/r.167

Gelek fikr û raman di hişê mirov de derbas bûn.

"Ne şîş bişewite, ne jî kivav" r.118

Ji herdu aliyan re jî daxwaza zerer nedayinê.

"Ne tas e, ne jî himam" r.24/r.121

Bo tiştê ku di ortê de tunebe tê bi kar anîn.

"Nêzîkê hev bûn" r.115

Di navbera kesan de samimiyet çê bûn.

O

"Ocaxa te ji te razî be" r.42

Wek dua tê bikaranîn ku ji ocaxê mebest malbata kesan e ku wek malbata te ji te razî be ye.

P

"Peyn nedida hev" r.107

Bo ji hevdu bawer nekirinê tê bi kar anîn.

"Por û poşman bûn" r.

Por û poşman wek ducarî hatiye gotin ku ji tiştek poşmanbûnê ifade dike.

"Poz lê nekirin" r.137

Bo tiştek ne ecibandinê tê bi kar anîn.

"Pîhna xwe lêxistin" r.137

Bo tiştek nexwestin, lê zivirandinê tê bi kar anîn.

R

"Reng avêtin" r.87/r.112/r.123

Bo tirs an kelecan bûnê ku rûyê mirov de reng diguherîne tê gotin.

"Riya malê, riya kadizê kirin" r.136

Bo li cihê zêde ziyaret kirinê tê gitin, zêde çuyin û hatin.

"Riya rast nîşan dayîn" r.154

Bo başiya kesan, tiştên baş nîşan dayin e.Li mirovan sevkê tiştên baş, rast kirin e.

"Roj bi roj helandin" r.172

Her roja ku derbas dibe ber bi xirb bûnê çuyîn.

"Roj neda serê wan" r.59

Bo kesên ku xwediyê jiyanekî baş ninin tê gotin. Kesên k udi tengasiyê de ne.

"Rûreş bûn" r.150

Bo kesên ku mehcup bûne tê gotin.

Q

"Qudûm di ber çok da hatin" r.169

Ev biwêj bo ji tiştek tirsandinê tê bi kar anîn.

"Qudûm şikandin/şikestin" r.147/r.187

Bê teqet, bê hêz mayîn,

"Qulê rûviya dest neketin" r.111/r.117

Bo li xwe veşartinê cihêk nedîtin. Ji tiştek revîn.

"Qurf ketibû hundirê dilê wî/wê" r.81/r.121

Bo tiştek edîşe kirin, ji tiştek tirsîn e.

"Qirka hev girtin" r.21

Nîqaş kirin, ji hev rehetsiz bûyin.

S

"Ser berjêr kirin" r.42

Ji sedema kesek fedî kirin e,ji şerman serê xwe tewandin e.

"Ser bextê min da ve" r.56/r.75

"Ser êşandin" r.166

Li yekê aciz kirin, rehetsiz kirin.

"Ser guhê razan" r.68

Bi kesek re an bi bûyerek re bê eleqedar bûyin.

"Serê hev êşandin " r.117

Li hevdu bêhizur kirin.

"Serê xwe dayne ser rêyek" r.173

Bo armancek xebitîn.

"Serê xwe dîwar xistin" r.69

Bo xetayek poşman bûn.

Ş

"Şik firî dilê wî/wê" r.88/r.111/r.132

Ji tiştek guman kirin.

"Şîrheram bûn" r.173

Bo kesên bê esil, xirab, re tê gotin.

T

"Tenişta xwe reş kirin" r.55

Li xwe aciz kirin, xemgîn kirin.

"Têketina dest" r.144

Xwediyê tiştek bûyin.

"Têketina orta du zinaran"

Orta du tiştan de mayin.

"Têkeve ça'v" r.107

Kesên ku bi fikir û çalakiyên xwe bi qîmet dibin.

"Têr xwarin" r.153/r.183

Bo kesên ku dewlemendin an pêwistiya wan bi tiştek tune tê bi kar anîn.

"Tiliya wî/wê din ava şuxul da bûn" r.53

Di karek an meseleyek de xwediyê parek bûyin.

"Tişt jê derneketin" r.128/r.179

Kêrî tu tiştek nehatin, tiştek nebûn.

"Topî se hev bûn" r.114

Bo meseleyek civînê îfade dike.

"Tu ku ew ku" r.111/r.112

Bo qiyasê tê bi kar anîn ku başiya kesek ji ya din zêdetir e.

Y

"Yaxa xwe xilaz kirin" r.150

Ji kesek an tiştek rizgar bûn, xelas bûn.

X

"Xeber pêş da birin" r.109/r.113

Di axavtinek de ji hedê xwe zêdetir xeberdan.

"Xeber xebera te ye" r.56/r.119

Gotina yekê ji aliyê rastiyê ve tesdîq kirin.

"Xeberdanê dirêj kirin" r.68/r.157

Li ser meseleyek bi gotinên bê hewce wê meseleyê zêde xeberdan.

"Xema wî/wê nebûn" r.108/r.126

Bo kesên bêkovan tê bi kar anîn.

"Xew nekete çe'vê wî/wê" r.83

Bo kesên ku bêxew mane an ji ber tengasiyek, problemek bêhizur bûne tê bi kar anîn.

"Xêr jê dîtin" r.165

Ji kesek qencî dîtin.

"Xuna yekê/xelqê mijandin" r.91

Ji yekê xwarin.

"Xwe avête ortê" r.118

Bo kesên ku hemberê tiştek xwe muxatab nîşan didin tê gotin.

"Xwe divêtine pêsîra wî/wê" r.108

Ji yekê medet sekinandin.

"Xwe kerr kirin" r.149/r.153

Bo kesên ku naxwaze bi meseleyek re têkildar bibe tê bi kar anîn.

"Xwe xwarin" r.172

Li xwe bêhizur kirin.

“Xwe zevt kirin” r.110/r.127/r.137

Bo tiştek an kesek sebir kirine.

“Xweliya binê pê te me” r.33

Z

“Zirav qetîn” r.58/r.133

Ji tiştek tirsîn e.

“Zor dayîn” r.125

Bo ku yek tiştek bike zextî nîşandan.

“Zor dida pe’niya” r.70/r.165

Bi peyatî çuyîn e an bo revînê tê bi kar anîn.

2.5. Di Pirtûka Kurdêd Elegezê De Nimûneyên Biwêjan

A

“Aqilê min nabire” r.28

Ji meseleyek bawer nekirin an jî dûrê mantiqa mirov bûn.

B

“Ber tiştekî hesab nekirin” r.18/22

Ji kesek re qîmet nedan û lê guhdarî nekirin, rêz nîşan nedan.

“Bi agirra lîstin” r.27

Tistên ku xeternak e û zerarê dide mirov re tê gotin. Bi tiştên xeternak re mijûl bûn.

“Bi guhê xwe bihîstin” r.23

Meseleyek an mijarek re raste rast şahîd bûn.

“Bin dest de bûn” r.12

Bo kesên wek kole bin xizmet û emrê kesek de ne re tê gotin.

Ç

“Çev dane wî/wê” r.12

Li kesek nêrîn.

“Çev de anîn” r.12

Li yekê ji bo tiştê ku kiriye poşman kirin.

“Çav lê ketin” r.14/20/24

Li yekê bêhemdî dîtin.

“Çev li rê bûn” r.28

Li benda kesek an tiştek bûn.

“Çi dihate ber dev gotin” r.12

Tiştên baş an xirab wek ku di fikrê mirov de derbas dibe anîn ziman.

“Çevê te birêjim” r.18

Bi yekê zilm û zordestiyê kirin.

D

“Daye navê” r.20

Rast an nerast bêhesab tevgerîn.

“Deng birrîn” r 13

Li hemberî tiştek an kesek an jî meseleyek bêdeng mayîn, eleqedar nebûn.

“Dest nedan” r.20

Alîkarî nekirin, piştevan nabûn.

E

“Ez ocaxê sond duxum” r.27

Ji ocaxê mebest malbat e ku ser malbatê sond xwarin bo rast gotinê îtimad dayîn e.

G

“Guh nedan” r.29

Xebera yekê nekirin, bêîtaetî kirin.

H

"Hevt govek bava de eslê min" r.10

Dema îzaha ku mirov ji kîjan malbatê tê dike "hevt govek" yanî heft bav pêşî de ji kîjan eslê ye tê diyarkirin.

J

"Ji dest derketin" r.11

Tiştên ku êdî ne aîdê mirov e.

" Ji dînê xwe derketin" r.10

Ev gotin gotinek olî ye ku dînê xwe guherîn an ji dînê xwe dûreketin e.

K

"Kerê kurê kera" r.18

Bo kesên li hemberê xwe re bi armanca heqaret kirinê tê gotin.

"Kerr bûn" / "Xwe kerr kirin" r.19/24/33

Derheqê meseleyek de wek ku mirov tiştek nizanibe tevbigere.

L

"Lingê wê erd nedigirt" r.33

Ev biwêj bo bextewar bûnê tê bikaranîn. Şadiya kesek an kesan dide fêm kirin.

M

"Mal xira kirin" r.12

Ji kesek an malbatek re zerar dayîn.

"Meznatîê kirin" r.10/13

Dema yek li kesek an malbatek bigire bin himayeya xwe ev gotin tê bikaranîn.

"Meriv bê derkeve dinyake din" r.14

Li hemberê meseley an bûyerek şaş mayin.

N

"Nano ziko xebitîn" r.9

Wek ku bi hawayek dijwar debara xwe kirin. Ji xebatek kêm dirav qezenç kirin.

O

“Oyînê bînine serê wan” r.9/17

Li yekê/î xapandin.

P

“Pêsîra xwe jê xilaz kirin” r.16/28

Ji yekî xilas bûn an revîn.

“Piştan wê/î bûn” r.11/16/17

Alîgir an terefdarê yekî bûn.

R

“Reng avêtin” r.29

Ji ber tirs an kelecenbûnê rengê rûyê mirov guherîn e.

S

“Ser çava re hatî” r.15

Bersiva erêniyê ye û wek bersiva silav dayinê tê bikaranîn.

“Sipî çolkî bûn” r.26

Ji tirs an sedemek din zerhimî bûn.

T

“Topî ser hev bûn” r.15

Tê wateya civîn an kom bûnê.

X

“Xûna me dixwin” r.37

Keda yekî bi awayekî neheq xwarin.

Y

“Yeka wan nabe dudu” r.21

Daxwaza yekî anîn cih. Hemû daxwazên yekî tetbîq kirin.

ENCAM

Mirov dema bixwaze li neteweyek nas bike divê derheqê jiyana wan û civaka wan de xwediyê agahiyê bibe. Bo nasîna neteweyek jî edebiyata nivîskî û bi taybet edebiyata gelêrî dibe çavkaniyek girîng. Bi rêya romanan jî, ku ew nimûneyên edebiyata nûjenin, em dikarin derheqê çanda neteweya ku bûyer di wê heremê de derbas dibe agahdar bibin.Armanca xebata min ev bûn ku di nava edebiyata modern de edebiyata gelêrî çawa cih girtiye, bi rêya edebiyata nûjen çawa çanda kurdî bi alîkariya edebiyata gelêrî li xwe nîşanê me dide, ji aliyê teknîkî ve bi nimûneyên gotinên pêşiyan û biwêjan vê mijarê wek mînak derxime holê. Dema em li edebiyata neteweyan dinêrin dibînin ku nivîs di bin bandora rewşa civakî, siyasî, aborî û hwd. de maye. Ev rewş ji bo kurdan jî eynî ye. Gelê kurd di jiyana xwe de bi çanda xwe ve girêdayîne. Bi taybet kurdên herêma kafkasê dema berhemên edebî nivîsandine di bin bandora çanda xwe de mane. Edet û usulên kurdan, jiyana wan di nivîsên wan de zêde cih digirin. Sê romanên ku me li ser lêkolîn kir jî wek mînaka vê fikrê bûn. Di Kurdê Rêwî, Sîber û Kurdêd Elegezê de derheqê jiyana kurdan û çanda wan de gelek agahî mevcûd e. Lê bi vê xebatê bi nimûneyên ku me ji van sê pirtûkan berhev kir dibînin ku edebiyata nûjen ji edebiyata gelêrî zêde sûd girtiye. 3 nivîskarên me yên bi nav û deng Sehîdê Îbo, Wezîrê Eşo û Erebê Şemo, him ji bo ku di pirtûkên xwe de zêde cih dane nimûneyên edebiyata gelêrî him jî ji bo edebiyata kurdî şexsiyetên qîmetdar in me li wan hilbijart.

Di pirtûka Kurdê Rêwî de; 49 gotinên pêşiyan û 174 biwêj, di Sîberê de; 7 gotinên pêşiyan û 123 biwêj, di Kurdêd Elegezê de nimûneyên gotinên pêşiyan tunebûn lê 35 biwêj hat berhev kirin. Di vê xebatê de gelemperî 56 gotinên pêşiyan û 332 biwêj hat berhev kirin, gorî elfabeya kurdî hat rêz kirin û bi kurtasî hatine şîrove kirin. Di dawî de dikarim bêjim ku ev nimunêyên ku ji sê pirtûkan hatin berhevkirin bo nîşandana têkiliya edebiyata nûjen û gelêrî jibo me bibe mînak.

ÇAVKANÎ

Açar, Zafer;*Berawirdkirina Biwêjên Kurdî û Tirkî Yên Têkilî Hin Ezayên Însan,* 2017.

Bingöl, Abdülkadir;*Gotinên Pêşiyan û Biwêj,* Weşanên Na, Îzmîr, 2014.

Erebê Şemo;*Kurdêd Elegezê,* Weşanên Belkî, Amed, 2015.

Eşo, Wezîrê;*Sîber,* Weşanên Lîs, Diyarbakır, 2016.

Îbo, Sehîdê; Kurdê Rêwî, Avesta, Stenbol, 2009.

Oncu, Mehmet; Gotinên Pêşiyan, Weşanên Enstîtuya Kurdî, Stenbol, 2009.

Öztürk, Mustafa;"Vekolînek Derbarê Gotinên Pêşiyan Ên Kurmancî De", Mukaddime, 2015.

https://ku.m.wîkîpedîa.org/wîkî/Biw%c3%AAJ/02.01.2017.